

kurdish

in latin characters

by *ibrahim bajlan*

author & journalist (khanqin - iraq)

conversion into latin characters

by *mahmud badli*

poet (al-hassaka - syria)

thanks to *munir khalaf*

le

namekanewe

birûsk

Katêk birûske deda le tewqî sereta

çawe riwanî bîstinî dengî

hewre tirîşqe meke

1973

hewlderêk

Hemiwan hest deken

belam şai'rêk niye

belkû hewlderêke

1999

nezanîn

Kes le xwedî xom tênaga

Weku min liyê têdegem

belam çend bê agam le xom

1973

xoşewîstî

Xoşewîstîye aweye asantirîn xirapet
beramber kesanîtir kirdiwete le bîr nekey
gewretirîn xirapey xelk bo xûd xot le bîr nekey
1997

pênûs

Eger pênûs kirdewe neka
bêhûdeye hewlî şemşêr
1993

pêşbînî

Hemû mirovêk beyambere
jiyan le ewe we dest pê deka
û kotayî dêt
1988

kameranî

Eger ême wergirîn: -
Le pit berestekan, rêzgirtin le xak û bapîran
û le aynekanî roj helatî dûrewe, û rewhaniyetekaniyan,
û le colekekanew pêşbînî û kolnedan,
le xaç perestanewe xoşewîstî û lêbûrdin
le îsalm germî bawer
û le 'ilmaniyet, lêk têgeyiştin û kiranewe,
û le mirovayetiyewe hewldan bo yekgirtin.
eger ême her hemû emanemane wergirt,
le hemû ewane we
debîne bextyartirîn mirov
1990

parçe

Nîştiman ewe parçe ye teke azadîman têda debênînewe
gewre we debêt taku gerdûn degirête xoy
û teskewe debêt taku le xeyalmanda dexinkê
1990

pêşbînî

... Pîr, ke hestî kird be katî lêk tiwanewe mûrîdanî le dewr koryan best û
daway diwa amojkariyekaniyan lê kird:-

û tî: -

xotan rizgar biken le made, ew ku min bexwastî xom le temenî heft salanda bûke şûşe dil xwazekem le jêr behejarêkî gerekekem bexşî.

ke le bexşîn ser qalmî kirdibû rizgar bin le xoşewîstî weku min be wîstî xom xomim rizgar kird katêk le hefde salî temen le jêr qorbanîm le xoşewîstiyêke mida le pêrawî hawrêtîm da.

le zanyarî rizgar bin weku min bexwastî xom katêk le bîst û hewtî temen da le ko kirdineweyî birwaname wazim hêna, ke ewendey nema bû, berew le xo bayî bûn bimba le ciyatî sadeyî û xakî bûn.

Le naw bang xotan rizgar ken weku min xom rizgar kird, bexwastî xom, katêk le sî û hewt salî têgeyîştîm ke, naw bang pûçe çûnku tirawêlgeye.

Rizgar bin le geran be di way mîtafîzîqya da, weku min rizgar bûn, be xwastî xom le çil û hewtî salanî temen da, ke dilniya bûm lewey ke fermanî rastî bo rastî cê bihêlim.

Xotan rizgar ken le komelayetiyê xeletênerekanda weku min bewîstî xom rizgar bûm le paş ewey le penca û hewt salanî temen da peyim bird, be hîç û pûçî zorbey helis û kewtekanî mirovayetî.

Le xelk rizgar bin, wehewlî xelwet gîrî biden ta detwanin eger weku min le şest û hewtî temen da ger hawrêkî be emektan dest nekewt, le hizr rizgar bin weku min be wîstî xom le hifta û heftî temen da le nûsîn wazim hêna kitêbekanim dirê çunke rêgirim bûn le sirûşt.

Le laşe rizgar bin ta etwanin, le hemû qonaxekanî jiyânitan da taku, eger katî rizgar bûnî yekcarîtan hat weku min amade bin bo rizgar bûn lew jiyaney ke eyzanin û, amade bin le, û têkel bin bewey ke ezanin.

1999

le asûdeyîyewe

şine

(pêş le diyarî kirdinî şwên û nûsînî kat)

Mint ebînî şineyek bûm, begerdûn da egeram ne sinûrim hebû, nezemen taku le encam da, le sî kor peyek da gêr samewe, eytir ziyatir hestim be jiyân kird, ke bûme beşêkî mirovî tiyayda.

1995

awaz

(katî awa bûn le xakêk da ke azadî be dest hêna)

Çend hozêk şer û şoriyan kird le ser zewyek taku yektiryan qir kird / û mîlkaniyan birayewe, xakekeş rizgar bû, le bîrewerî da hîç nema tenya awazêkî bilîmet ke hewlîda neyarekan le yek nizîk bikatewe ne ew ber xurdar bû, le dananî awaz ne serkewtubû le naw bijî kirdin, le nêwan zoran bazekan da, belku sirûşt û pellewer, dar û cogekan awazî man, awazî bilîmetî.

û hîzyan ew û te we, belê sirûşt minî ew û te we.

1997

hunrawe

(katî kipî le kinarî çolga)

Le bîrewerî gelêkda, cêgor kê m kird, weku hunraweyekî bê huner, ke delêt:

role:

ger bîr mit kird,

ke têkilawî, koçim boy

jiyanî xot be çirî bijîye

her katêkêş têkelawî rolî xot bûyît

were xelwetgakem ke le , nebo, bûda

alewêda em bînîtewe pê nûsêk û lapereyek kaxezim helgirtîwe

be diway noyîda egerêm

1997

gaberd

(serdemî zeynî xew bînî nî, biyabanî goçî le mengoliya)

Ke bûme berdêkî hellan, hîç mirovêk toxnim ne kewt bû, lewe pêş ke dû dildar be tînîşt mew beyek geştin, û xoşewêstîyekeyan le ser berd helikolî bome kêlî dildarî û mêjoyek bo şwênwarêk.

1995

wîjdan

(waz pêhinanêk le coşî xebat da)

Mirovêkiyan be ser mida sepand, û sepêndiram be serî da, koşîşim kird wir encim da le gelî da, le ser demî, mînakayetî herzekarî da, her weku le têkoşanî tafî gencî da, belam ew, ke rêgay siyasetî helbijard weku ser çawey bijêwî jiyani, ew serkewt û pelî berz bû, û hukim ranî kird, û le xoy bayî bû

bu xira bû, eger pirsyarî lê bikey bo wehay kird û eka, nimûneyî û mînakayetî le kuy ma, çî beser têkoşan hat biyanût bo dehênêtewe le çer sanewe stemkirdin le kesanî tir, bo parastinî pile û destkewtekanî yeka.

ewe bû wazim hêna.

1997

geraweyek

(serdemanêk ne şwênî diyarî kirabû ne zeman nûsira bû)

geramewe bo hêz, ne şwênkim bû ne zeman, nehest, pêkirdin ne hestpêkiraw...

1997

sultan

Merg dalangêjî bû le dewrî xelwetgakey sultanewe, belam katêk zanî jiyani pîr çon bû, wazî lê hêna, belam pîr, bangî mergî kird firyay bikewî, merg hate bangewaziyewe mezin têkilawî sirûşt bû, kariyan le yektir kird, kar kirdinêkî gerdûnî, betewawetî weku her hemû ewaney pêş ew û ewaneş le paş ew, be têkilaw bûnî gerdûnî bûye beşêk lew rastiyeke herdem le goşîşda bû le pêrawî geyîştin pêy...

Xêra dost û kes û gelekey rûyan kirde xelwetgake taku diwa serincî gewrey wilat biden, hendêkiyan bon û beramî mixûriyan bo pîrozî sultan ekird henêkyaniş be çawî xoy temaşay xermaney ronakî û noriyan kird ke le xodî xelwetgakewe berz bûye û bangeşeyan bo peyamberêkî nûye ekird, katêkîş korezay gewre dest pêşxerî kird û wesiyet namekey bapîrey.

kirdewe ewey tiyayîda nûseraw bû bo amade bûwan xoyêndewe:

"jiyanim wesiyet nameye û raspardeye bîxoyênênewe û çendî lê werbigrin û lebîrtan necêt, hemû katêk û serdemê, her gîz ke hîç kesê le hîç kesêkî êwe baştir niye, weku ewey betwawetî ke hîç kesêk li êwe baştir niye, minîş le mirovêkî asayî ziyatir nîm eşêt yekem azad bibûm û yekem têkilaw bûyekan le hizr da omîdewarim ke diwatirîn kesyan nebim legel ewey da ke dilniyam min le ewey ke ne yekem têklaw bûm le rastîda û ne axirîn kes, belam rojî koçî diwayîm babête cejnî lêk tiwanewe le naw rastî û rizgar bûnî gerdûnî da, belam aramgakem ba le xodî xelwetgakem bêt, sade û asayî, û leser kêlge key binûsrêt: alêre da mirovêkî delesewzî, serî nawetewe. belam xelwetgakem ba dergakey weku hemîşe kiraweyî bimênêtewe, lêgerên weku xoy bebê destkarî û çakkirdnewe, taku eger sirûşt û îstî bîfewtîni û

şwênearî ne hêlêtewe, heresî pê bihênêt bewey tiyayîdaye bîrûxênêt û safî katewe.

"xoşewîstekanim, xoşîm bo biken, her çendêk cêga firawan bêt: çunkû na cêga firewantire, û her çendêk zeman dirêj bêt, çünke na zeman dirêjtire, tiwanî hest pêkiraw her çend bêt, belam tiwanay hest pênekiraw behêztire, mawey bûn her çend bêt belam mawey nebûn firawantire.

ayar 1996

têklaw bû

pişkiner

Leşew dagirtim ke binihênî xerîkî pişkinînî zibildanekan bû serzeniştîm kird û cêm hêşt bew pele kotîwe û bew haley ke ew tiyayîday bû...

Xiwet bexawen nîhad ejmêrî hey bê abrû, erkî çawdêrîm xiste astoy xom ewey destî pêkird, û destim kirde çawdêrî kirdinî hatinî ew beste zimane şew le diway şew biyaniyan le şwên beyan, paşan le hemû katêk da le katekanî roj da, kewa diyar bû kabira hogirî karekey bû, le ciyatî ewey be nihênî encamî bida weku seretakanî, destî pê kird be rêk û pêkî û şarezayî, taku ke çawî pêm kewt le axirîn dîdar le nîwanman da, min hestim be sermezarî kird.

1999

çûne naweyek

Ke dadwer kotayî be gelalekey hêna û bergirî le ber girêkey bo ewe dengî dadkar nebîstira ke ew biwaye biryarî dadgay bidaya, rûnakêkî tarîk ke, le kilaw rojnekeve aşkîra bû ew kone nefesga û bendîxane bû, bî dengî bangî kird bo nasînî dadkar, û bîstinî biryarekey, nizîk bû mewe be bê ewey bicolêmwewe riwanîm, çawekanim nûqa bûn ke awêneyek rojêk le rojan dirustim kirdibû be dadkar nasandimî, û biryarî hukmey û tewe be wijdanêkî mirovanewe ke le û şey bera et ziyatir nazanê, dilniya bûm min wam le hizorî xom da û ke dijeyektirekan neman û têkilaw bûn tewaw bûn: eha ewe ta min dîdar legel bêxemberan û şerfiroşanekem û têkilayanebim û legelyanda û tiyayanda û legel xuda û xoşewîstî û tiyayîda, hemiwan heman

çare nûsiyan heye, bilku wîjdan xoy zaminî hawsangî mirovayetiye ne weku tirsnaqe cora û corekan be geşt şêwe çiyawazekaniyewe egerê mewe bo ew tiwanaye ke hêšta beşêkim le ew da û le bûn û ne bûn ke cêm nehêla, ne belku bûme tiwanay – xudî nebû bûda, çunke hîç gerdeyek le paş mirdinda niye.

1998

derbazbû

Min berdewamim le geranimda paş hatinewe, be hoy peroş bûnîkî mirovne ke hêšta le ser zewî mawe lew cêgay jiyânî raburdûmida bîre werêkanim le kelîm daye le ser serdemî jînmewe negore le diway serdanim, boye, min berdewamim le geran û geşt da le zeme cêda.

Herçî min lezanyarî reha werastî geştî da derperîwim berew noy û berew ewey leserwî mirovî emro sibe ênêş daya têgeyîştîm ke le gelim daye, xemim mirove le jiyânîda xemim emroyetî û sibeyniye, xemim kamiraniyetî û azadiyetî belam helhênamim eweye ke hîç manayek niye bo jiyân û mirdin û tiwana le herdû royîda, zanyarî, û rastî. manayan niye ger mirov nebêt, belam pîrsyarim eweye ke wa bû êtir bo kameranî le zewîda siteme? dilniyam min le kotayî mirov, çunke min tiyayîdam belam çî sebarete be jiyânî? aya rêgaye heye bo baştir kirdinî? xemim mirove belam tiwanay yarmetîm niye, mirov xemme, تنها le mirdin da têr bûnî bîrsî û çaw çinoke, û xewnî xobexş û heleşeye, û zanyarî zana û nezane, û yeksanî nêwan hemiwane, xemim mirove belam min le têkel bûnim, nekat ne şwên, mirov û gerdûn, bejyan û mergewe, dêsan le têkel bûndan, ke wa bû xemî min û xemî mirov û gerdûn çîye êtir.

Azadim min, rizgarim le derbirîn, be hokar û pîtekanewe, azadim min rizgarim min le hizr, le kot û sinûr dariyewe, azadim min rizgarim le mirovayetî, le kar ş bar û xefet, rizgarim min le bankirdin bo azadî, rizgarim min le zanistî reha û rastî giştîyekan rizgare mirov azade le xuday gerdûn, rizgare xuday gerdûn azade le mirov, rizgarim min, rizgare mirov, rizgare xuday gerdûn, serferazim min serferaze mirov, serferaze xuday gerdûn.

1999

le *xew bînda*

kotayî

... Le diwasatekanî kotayî temenî xewbîn bîrî kirdiwe û boy derkewt:

Bîrî kirdewe le wey ke xuda le dayik bû, û geyişte doxî lawî, û pîr bû, le mêşkî mirovda ke hendêk le xelkan gumaniyan kird, ke be mirovyan zanî ke mirovî bo gemey xoy dirust kird boye galteyan pê kird ke çî kesanêkî tir hênde lêy tîrsan taku le bîryanewe çû bijên. geyîştîme ew encame ke katêk ke mirovekan geran bo xudawend, wêney beşêwey xoyan zanî xudakeyanpîr bû, lezimanî û cêgada. win bû le hebû nebû da le bîrî mirove çû, ke ewan, be mirdin da, le zeman û şwên têper ebin lehebû nebû û têkila debin be hemû ewey boy degerên be şwênîda, û nagerên.

mirov bîrî lewey kirdiwe, çunke hozane, le mirdin têdega, boye, ziyatir lêy detirsê û çunke bîrmende û derk pêkere, natwanêt rizgar bêt û be asanî têkel bêt legel tuxmekanî jîyan û gerdûn da, helî hênayewe ke pêwîste mirov bîr û hizrî ser le nêw kar bihênê le pêrawî em dû çemke. geyişte ewey ke xelkî omêdewarin be jîyanî paş jîyan ke wa ezanin weku ewey ke tiyayîda ejên û heta hetayîye û geyişte ew encame ke be 'eqlewe naçêt jîyanî diwa diwayî weku jîyanî pêş pêşîn bên denabêtam debû her weha ke mirov katêk derkî be çarenûsî paş ew jîyaney ezanê kird êtir çon nabête xuda? bîr lewe kirdewe le xelkî le koşşiyanda bo biwa le yektir dûr ekewnewe egene babetanêkî nakokî, û zoran bazî û helî hêna ke eger her ebêt mirov birwa bihênê berastî bo çî le xoy nizîk nabêtewe û birway pê bihênê bo mirovayetî û be beha diyarekaniyewe dîsan bîrî kirdewe le birwa û geyişte ewey birway tîwirî asantîrîn rêgaye bo rizgar bûniyetî na misoger ke çî kar kirdin le pêrawî be mirov kirdin rizgarî tiyayîda merce bîrî kirdewe ke mirov le rabirdû da ziyatir lewey ke em karîgerî le ser bêt keçî emro destî kirdiwe be wey karîgerî em ziyatir bêt le ser sirûşt ne belku daygîrî kirdiwe bo xoy û helhêna ke mirov ger tiwanû bêtî bûnî xoy biparêzê le mêjûy konî ke le ser xo deriwîşt belam ke mêjûy hawçerxî be xêra riwîştûy zaminî le naw birdinyetî, bînî be kurtî û puxtî, mirovanêk ber dewam nabin ke regez û ziban û xak û birwa û ayîn cêwaziyan bixate nêwan, û hîç şitêk xoyan nekatewe cige le çaw çinûkî û mirovayetiyan le bîr çotewe.

2000

sirûdekan

9

Min kur pem, min herzekarim
min pîrim, min kotayî
min bawkim, min cigergoş
ez di daykim, ez ber hem

Ez mirdem, ez hajandize
min çandim, min dirwîne
min xeyrim, min bexşeş
min şerim, min kwêrewey

Ez dildarîm, ez xoşewîstî
ez rîqim, ez lîlî
min hîwam, min omîde
min bextim, min çarenûs

Ez bîrim ez rastî
ez birwam, ez wîstiraw
min bînrawim, û eweydebînirêt
min hemû ewey, be asmane serkewt

Ez jiyanim, ez mirdin
min hebûm, min nebûn
min xudam, min nemirî
min hemû şitêkim, min hîç

min mirovim
2000

11

Min hem, wate, berpirsim
to heyt, date, berpirs
ême, be hoygerêwe, peywîstîn
be hawkariyewe, derbestin
le xeyr û şere, naxoşî û xoşî
dest le naw destîn
2000

*elif ya**le koçgirdû*

çend
 min çend katim le hîwa da le fêrû da
 le şewqeperwişîda bo maçî kiçêkda
 çend katit le des çû le xewnda,
 le xeyalda, bo mirovayetêk le jiyanda
 çend katit le des çû le deryada
 le erizda, le omêdêk le asman
 ax... ax
 ax ger kat ser le niwê le destem
 be fêr û bê hode
 2002

le
 Rêgay geranewe
 le pişûy jiyanewe
 ewey ke kar lêkirdinim hebû le gelêda û têgeyiştim
 ewey ke lêkimdayewe, hewlî hozanînim da,
 le rêgey geranewe û le pişûy jiyanewe
 zanîm ke pirsyarekanim derbarey
 zortirin le û lamekanim sebarey be ewewe
 2002

dwayî
 Firmêskî çaw hate xwar berastî ewe firmêskî koçe
 eşêt bo cudayekî xemnak û çire
 ya xod bo rizgariyekî dilxoş û be coşe
 diwayî firmêskî çaw reja:
 ewete hanimeda bo seferî derya
 ewete keştîwanim le xoşiyeyekî bê wêne da
 emin sirûdêk elêmewe,
 ke sirûdî koç û sefere, eweye ke rojêk
 honîmetewe
 emin bo yekem car eylêmewe,

diwa care ke tiwanistim behanemewe nehat
her eylêmewe renga katêk lêy bibmewe, male awayî bikem
her eylêmewe ewete min erom
ewete min bexoşêwe epermewe
2002

le *tewerekanewe*

qayîn

Çît kird ey Qabîl ya xod mirov çê pêt kird, e tu biraket kuşt ya mirov tûy
kirde bikuj le xeyalî xoy da le paş ewey dirustî kird ta bîkujêt, ger rast bêt
xuda Habîlî le tu derkewtû tir kird, qurbaniyekey wergirt, ke çî qurbaniyekî
tû, û xoşê wêstiyeketî be diway da mandabûtî pesend nekird renga hokare
barsokereket pêy bibexşim sebarete bewey kirdit tû bûnewerêkît bîr û
tiwanakant sinûrdarin, belam eger Habîl tûy pikujtaye û êray ew soze
taybetiye, ke xuda pêy bexşiyê, hergîz min lê xoş ne ebûmewe.
2002

le xoşewîstî

Ew nazdarem lewê bînî le ser xacewe helwasira bû, lewê bînim, xoy ebexşî
le pêrawî kesani tir defewtêt taku ewey tir xoy bidozêtewe.
ne diwandim, ne qesey legelmida kird, belku bêdeng bûyn.
2002

aşekan

Zor be şwênit egeram Sêrvantis, le Donkuxte ziyatirim nedî ke beswarî
risintî hespekeyewe berew aşekanî herwîşt ke çî cige le Santşoy yawerî be
emekî be kolî kerekîyewe be diwayda tekaneda tu Donkuxtet be zindoyetî
hêştewe xoşewîstekem mêkil, le mêşkî xelk da û le xeyalan da. Qeydî niye,
min tu le sereroyek ziyatir nabînim degerêy le şwênî sereroyekî nûy da. bo
palewaneket ke hewîş xotî, diba biroyin pêkewe bo sereroyî, diba Konkuxte
û Sentoşo, da bo dozîneweyîtir çawerwanî çît.
2002

dag

Diwem boy le wergirtinî hemîndaryetî giştî rêkxirawî neteweyek girtûkanda
le himerşild siwêdewe hatî ke wilatêke maweyekî dirêje agayî le ceng niye,

û herkit çespanîni aşîtiye le cîhanda ta bot dekrêt, helsay be erkeket be baştirîn şêwe, û hewlî ser be xoyî rêkixraweketda, ta radeyekî berçaw serkewtû bêt, bîrtekem, beradeyek wêney tu kemele zemenêkda rêkxiraweke kirawetewe çareway tenya rayî û take hêzî.
2002

rolekan

Rolekan tey Corc Waşinton, eye ew kesey rizgar kerî, wilate yekgirtiwekanî Emrîka boyt rolekantey, ewey be destpakî û rast berwey têkoşayet, le pênewî mirovêkî baştir, le paş dûsede da le koçî dwayît eyanbînim, geştunete peleyek l pêşkewtin, ke kewtûnete rawkirdinî merîx bogeran be dway serçawey awda tiyayda, keçî awe zorkey ser zewî be cê dehêlin bo pîs bûn, û sideha milyon le bî çarekanî haw regezî xoyan le ténûyetîda denalênin.

aye wêstît bem corebin rolekanit, ey Waşinton?
2002

le *bîreweryewe*

le *pêşekyewe*

Role,

çendîn car le bapîret bîstume ke eyût ke, jimarekan kujtiyan, wate karî berêwebir dinekey ew jimaraney, ke tiyayîda bû duryan xestewe le nûsîn, belam min pê elêm ke pêtekan bûn minyan kujt çunke zorbeyanim le cêgey xoyanda danenya, mebestim le çendîn berhemêkî nawêjeyîye, her çend sûd bexş bûn, bo kesanêkî zor be dilyan bûn.

her çey bûne mayey peyda kirdinî bijîwî jiyanim, keçî rêgirim bûn le nûsîn ew babete edebiyeyane, ke tenya ewan, hemû bûne werkan tiyayanda kobûnetewe.

hey hewlder bo rizgar bûnî.

hemû mirovî regî xoy heye pêwîste şanazî pêwe bikat.

her çonî bêt, be mercêk şite ciwanekanî biparêzêt, çewtekanî dûr xatewe. belam regî tu çûte qolayî xakî pêxemberan û nêrdirawekanewe. mebestim tenha diyarekanêkan niye, belku ew pêxember û nêrdirawe û piyawe pêrozekane le helgirî zanist û ronakbîrî, û hemû mirovêk mirovayetî xoy beser bird be ciwantirîn şêwe be giwêrey ew çake mirovayetiyaney bawî beserdemî xoy kebaw bû le serdemî xoyda, role, regekant le rojhelat daye, ke dilî cîhane, aramîkan dozînewerî Îyl xudawendî yekta, nawbangiyan bot hêna, Nu'man yan xizmet karî beristgay Îyle, belam pêşewa Nu'man Şamî, le gullî çak bûye le sibey nohemî pêş Mesîh li ser destî Yeşû'e pêxember be xoşuştinî hewt car le rûbarî Erden her çende xudî Mesîh be zimanî aramî dedwa toş ey kurî Fînîqyay Ken'anî, pêtekan zadey tu bûn, her çend bo maweyekî dirêj xayen le molkeyetî tu neman bejyarekanî dîke dewlemend bûn belam nasnamey xoy le dest da. Toş kurî Erbanêkî ke piştêwanêkî rastî bûn çendîn helewêstî ser weryan tomar kir her çend ser weryan kij bû taku omêd nema be berzbû nêwe toş kurî Lubnanî ke be tak bexşî her gîz xobexş nebû, hokeşî bazirganî kirdin bû be hemû şitêkewe tu kurî Kilîsay Meşriqîke le mêjû da regî da kutawe, her çend bedabeş bûnewe belam her katêk dengî sirûdî berz debêtewe xuda amade debêt şanazî bike rolekem, be hemû emanewe û ewey ke hî xote xiwet medizewe lewey ke le ser ta belam le bîrt neçêt ke tu herdem û pîş le hemû şitêk kurî henokey û kurî mirovayetî be giştî diwa carîş tu kurî binemaleyekî rolekanî hogirî zulm û stem kirdin nebûne, ewey bo mirov beste ke stemkar nebêt be manay firwantir û heme layantir bo encam danî stemkarî taku mirov be mirovayetî bijêt wîjdanî xiwet asûde ke be zulm lêy kirawî le bendîxane, barî meke le stemkarî le azadî da.

1998

الثقافة بالمجان

Ath-Thaqafa bil Majjan

Série littéraire gratuite établie et dirigée depuis 1991 par
Free of charge literary series established and directed since 1991 by
Serie literaria gratuita establecida y dirigida desde 1991 por
Naji Naaman

najinaaman
an-najiyyat

AN-NAJIYYAT

النَّجِيَّات

© *Tous droits réservés – All rights reserved – Todos los derechos reservados – الحقوق محفوظة*
Maison Naaman pour la Culture & www.najinaaman.org